Ji Aliyê Sosyolojiya Edebiyatê ve Bikaranîna Têgeha Eşîrê di Kilamên Dengbêjiyê de

The Use of the Concept of Tribe in Dengbêjî Kilams from the Perspective of Literary Sociology

Edebiyat Sosyolojisi Perspektifinden Dengbêjî Kilamlarında Kabile Kavramının Kullanımı

Ferhat ÇİFTÇİ

Ferhat Çiftçi | https://orcid.org/0000-0003-4117-2477 | ferhatciftci1@gmail.com

Asst. Prof., Muş Alparslan University, Muş, Türkiye

ROR ID: https://ror.org/009axq942

Submission Date	11.04.2026
Acceptance Date	19.06.2026
Publication Date	30.06.2026
Article Type	Research Article

Citation:

Çiftçi, F. (2026). Ji Aliyê Sosyolojiya Edebiyatê ve Bikaranîna Têgeha Eşîrê di Kilamên Dengbêjiyê de. *Nubihar Akademi* 25, 01-30. DOI: 10.55253/nubihar.2026.1928166

Puxte

Kilamên dengbêjiyê, di çand û edebiyata kurdan de cihekî gelekî giring digirin. Tê zanîn ku edebiyata devkî, bêyî kilamê nayê fikirîn û ew wekî cureyeke berpêş e. Bi vî awayî kilam wekî olana jiyanê ye ku bi rêya çand, huner û edebiyatê di avahiya nasnameya takekesî û civakî de roleke sereke dilîze. Ev gotar, çend mînakên kilamên dengbêjiyê dinirxîne bê ka di nav wan de têgeha eşîrê ji aliyê sosyolojiya edebiyatê ve çawa hatiye bikaranîn. Ji ber ku têgeha eşîrê ji bo kurdan hêmaneke avaker e, wateyên cihêreng dihewîne. Herwiha bandora wê jî li ser kilaman zêde ye. Ji bo vê amancê di vê gotarê de hin kilamên dengbêjan ji aliyê têgeha eşîrê ve hatine dahûrandin û bi têkiliya civakî hatine şirovekirin. Encamên vê lêkolînê nîşan didin ku eşîr, di kilamên dengbêjiyê de wekî olana jiyana kurdan nirxekî berpêş e û di qada civakî, takekesî û siyasî de bi wateyên erênî yan jî neyînî hatiye bikaranîn. Ev yek di çarçoveya sosyolojiya edebiyatê de ji me re "hevbandora edebiyat û civatê, mijar û naverokên civakî, rolên civakî, peyam, temsîl û wate, şewqdana civakî, tîp û karakterên civakî an jî taybetiyên kesayetên giring, têkiliya komên civakî" û hwd. nîşan dide.

Peyvên Sereke

Kilamên dengbêjiyê, eşîr, civat, takekes, sosyolojiya edebiyatê.

Abstract

The *kilams* (songs/narratives) performed by dengbêjs hold a significant place in Kurdish culture and literature, occupying a dominant position in oral tradition and reflecting various aspects of life. They play a crucial role in constructing individual and social identity through culture, art, and literature. This study examines how the concept of the tribe is employed in selected dengbêj *kilams* from the perspective of literary sociology. As a foundational element in Kurdish society encompassing multiple meanings, the concept of the tribe has a considerable influence on *kilams*. Accordingly, the study analyzes selected dengbêj *kilams* through this lens and interprets them in relation to their social contexts. The findings reveal that the concept of the tribe constitutes a central value in dengbêj *kilams* as a reflection of Kurdish life and is articulated with both positive and negative connotations across social, individual, and political dimensions. This situates the concept of the tribe within literary sociology, highlighting its relation to the interaction between literature and society, social issues and content, social roles, messages, representation and meaning, social reflections, social types and characters, and relationships among social groups.

Keywords

Dengbêj *kilams* (song/narrative), tribe, society, individual, sociology of literature

Öz

Dengbêjlerin seslendirdiği "kilam"lar (şarkı/anlatı), Kürt kültürü ve edebiyatında önemli bir yer tutar. Sözlü edebiyatta bu tür başattır ve kilamlar olmadan sözlü edebiyatın düşünülmesi mümkün değildir. Bu çerçevede kilamlar yaşamın yansımalarını içerir; kültür, sanat ve edebiyat yoluyla bireysel ve toplumsal kimliğin inşasında önemli bir rol oynar. Bu çalışma, bazı dengbêjî kilamlarında aşiret kavramının nasıl kullanıldığını edebiyat sosyolojisi açısından incelemektedir. Çünkü aşiret kavramı, Kürtlerde kurucu bir unsurdur ve farklı anlamlar ihtiva etmektedir. Bu açıdan kilamlar üzerinde de etkisi fazladır. Bu amaç doğrultusunda çalışmada bazı dengbêjî kilamları aşiret kavramı açısından analiz edilmiş ve toplumsal bağlarıyla yorumlanmıştır. Çalışmanın sonucunda aşiret kavramının dengbêjî kilamlarında Kürtlerin yaşamının bir yansıması olarak başat bir değeri teşkil ettiği ve toplumsal, bireysel ve siyasi alanda olumlu ve olumsuz anlamlarla kullanıldığı görülmüştür. Bu sonuç, edebiyat sosyolojisi çerçevesinde aşiret kavramının "edebiyat ve toplum etkileşimi, toplumsal konular ve içerikler, toplumsal roller, mesaj, temsil ve anlam, toplumsal yansımalar, sosyal tip ve karakterler ya da önemli insanların özellikleri, toplumsal grupların ilişkileri" vb. karşılıklarına işaret etmektedir.

Anahtar Kelimeler

Dengbêjî Kilamları (Şarkı/Anlatı), Aşiret, Toplum, Birey, Edebiyat Sosyolojisi

Destpêk

Meriv, di jiyana xwe de bêyî civakê nikare bijî. Ev yek ji aliyê xwezayîbûna wî pêk tê. Her çiqas jiyana meriv digel vê rastiyê bidome jî hêmanên wekî erdnîgarî, ol, çand û hwd. hin cihêrengiyan derdixîne holê. Avahiya civakan bi vî rengî şikil digire û civat xwe li ser van hêmanan diyar dike. Nirxên bingehîn bi rêya hest û fikrên civatê, biryar û nêzîkatîyên wê ve pêk tên û civat taybetiya xwe weha qezenc dike. Di vê çarçoveyê de avahiya eşîrê, diyardeyeke giring û berbelav e. Meriv, di dîrokê de hema bêje di nava her komê de rastî avahiya eşîrê tê. Kombûna eşîrê di eslê xwe de ji aliyê nirxên olî, îdeolojîk, netewî û aborî/erdnîgarî/siyasî û çandî ve şikl digire (Bozkurt, 2021, r. 52). Ji ber ku meriv, di jiyana xwe de hewcedariya hin tiştan e û ev wekî hewceyên binyadî tên zanîn. Xwarin û vexwarin, cihbûn û parastin nebin meriv nikare jiyana xwe bidomîne. Piştî van jî hewceyên civakî û çandî tên ku ev jî li ser şirîkatiya takekesan ji bo hebûna civakî û jiyaneke wargehîn hêmanên jêneger in.

Avahiya eşîrê, di nav jiyana gelên Rojhilatanavîn de giring e. Di jiyana kurdan de dîroka civakî bi vî rengî şikl girtiye û şênber bûye. Hêmana eşîrê, ji bo civaka kurdan wekî şêwaza jiyanê bûye parêzgehek. Vê rastiyê bi vî awayî di rûdan û rewşên cur bi cur de rolek girtiye û her dem xwe nîşan daye. Rêxistîbûna kurdan a civakî bi piranî ji binyada dab û nerîtên sed salan ve tê û ev têkiliya civakî diyar dike ku ev jî digel binyada avahiya eşîrê ye (Uluç, 2010, r. 39). Hêmana eşîrê, li ser van taybetiyan divê wekî avahiyên duhêlî jî bê famkirin. Têkiliyên navxweyî û yên derveyî bi vî awayî pêkan dibin. Ev yek dikare wekî ji hevgirtineke civakî û têkoşîneke derveyî jî bê navandin. Bi vî rengî hem di nav eşîrê de hem jî di navbera eşîran de lihevhatin û nakokî li gorî avahiya eşîrê çareser dibin an jî encam digirin. Ji ber vê yekê dikare bê gotin ku avahiya eşîrê di nav kurdan de hem biderfetiyê hem jî bêderfetiyê aniye holê. Li gorî Şur û Çakmak (2022, r. 10) eşîrên kurdan, bi têkiliya siyasî di navbera îteat û serhildanê de mane û vê yekê jî di pêvajoyê de ew rastî bandorên erênî û neyînî kirine. Li gorî van nivîskaran her çibe jî dîsa her eşîra kurdan xwedî taybetî, dîrok, karîna siyasî û herî dawî xwedî şexsiyetekê ye. Loma jiyana kurdan û di nav wê de avahiya eşîrê hertim xwe bi awayekî nîşan daye û digel berdawamiyekê diyar bûye.

Wekî her tiştî hêmana eşîrê jî ji ber destê demê guheriye. Loma demên berê û yên niha ji aliyê eşîrê ve nikarin wekî hev bên hesibandin. Li gorî Bozkurt (2021, rr. 26-28), bi hêmanên pêkhate, şêwaza jiyanê, sosyolojî û serokatiyê ve têgihiştina eşirê ya berê û ya niha ji hev cude ye. Ji bo demên berê dikare bê gotin ku saziya eşîrê wekî fokûsa jiyanê xwe nîşan daye lê îro di hin cihan de hêmanên nirxî û çandî ji destê diyardeya bajarîbûnê ve ji hev veqetiyaye. Li gorî destkeftiyên xebateke nû, avahiya eşîrê digel fonksiyonên pêkanîna ewlekarî, piştgirî û nasnameya civakî ve baweriya civakî zexm dike (Eroğlu, 2025, r. 223). Wekî demên berê qala têkiliyeke xurt nikare bê kirin. Lê dîsa jî bi sirûştî û berdewamiya jiyanê, avahiya eşîrê ji xwe re formên nû û rêyên cihêreng dibîne.

Ev xebat, çend mînakên kilamên dengbêjiyê ji aliyê bikaranîna têgeha eşîrê ve dinirxîne. Em di vê xebatê de dixwazin diyar bikin bê ka têgeha eşîrê di nav kilamên

mînak ên kurmancî de li gorî sosyolojiya edebiyatê çi wate û peywendiyan dihewîne. Ji bo vê yekê me rêbaza dokumanî û di bin wê de jî analîza naverokî bikar aniye. Têgeha eşîrê bi vî awayî ji aliyê qada sosyolojiya edebiyatê ve di bin hin sernavan de li gorî "hevbandora edebiyat û civatê, mijar û naverokên civakî, rolên civakî, peyam, temsîl û wate, şewqdana civakî, tîp û karakterên civakî an jî taybetiyên kesayetên giring, têkiliya komên civakî" û hwd. hatiye şirovekirin. Ji ber ku bi gotina Moran (2012, r. 86) rexneya sosyolojîk bi piranî teswîrî ye û li ser tesbîta rewşa civakî tê kirin û ew yek di derheqê berhemê de ne nirxandinek e. Di vê xebatê de hatiye dîtin ku di kilaman de tenê navê eşîran derbas dibe yan jî bikaranîn û peywendiya eşîrê gelekî berfireh e. Me di vê xebatê de bala xwe tenê daye têgeha eşîrê. Loma ev xebat nirxandina xwe li ser kilamên mînak û yên ku di nav wan de bêjeya eşîrê derbas dibe sînordar kiriye. Metnên mînak ji *Antolojiya Dengbêjan* hatine wergirtin ku ji aliyê Ömer Güneş û İbrahim Şahin ve hatiye amadekirin. Ev berhem bi çar cîldan e û dengbêjên wê Şakîro, Huseyno, Reso û Mehmudê Hesê ne. Di vê xebatê de bîst û heft kilam hatine nirxandin. Kilamên mînak ji aliyê wan dengbêjan ve hatine vegotin. Hin kilam ji aliyê van dengbêjên berbehs ve cuda cuda û digel hin cihêrengiyan ve hatine vegotin. Loma hêmanên hevpar bi hev re hatine pêşkeşkirin da ku di nirxandinê de dubare nebin.

1. Sosyolojiya Edebiyatê

Edebiyat, bi hilberîna takekesî pêk tê. Herçiqas ev yek ji me re derheqê pêkanîna wê de agahiyê bide jî ji ber ku edebiyat bi awayekî sirûştî wekî dengdayînekê li ser mixataban digihîje kiryara xwe ya temamker, rola civakî jî nayê înkarkirin. Dîsa dinyaya derveyî wekî olandayînekê di nav berheman de cih werdigire û hest û fikrên nivîskar yan jî helbestvên bi vî şiklî xwe didin der. Ev xisûs di qada edebiyatê de li hemberî taybetiya takekesiyê taybetiya civakî datîne. Ev dijberî hevdu nînin û dijraberî wekî temamkerê hevdu tên hesibandin. Loma dikare bê gotin ku ji çavkaniya edebiyatê heta besterobar û devêçem hêmanên hevpar hene û her yek bi taybetiya xwe rola xwe dilîze. Ev yek beşên îcrakirina edebiyat û fonksiyonên wê ji me re nîşan dide. Bi gotina Alver (2012, r. 17) edebiyat di dema pêkhatinê de digel fikara estetîk û edebî bi hêmanên civakî, polîtîk, olî û îdeolojîk jî wekî aktorekî derdikeve pêşberî me.

Di eslê xwe de di qada edebiyatê de rolên civakî gelekî berfireh in. Hêmana civakî û di têkiliya wê de dîrok, serdem, şêwaz û nêzîkatî, cure û berhem û hwd. li gorî xwe xwedî taybetiyan in. Her yek ji aliyekî ve dikarin li ser rolên civakî bên nirxandin û bi vî awayî mijar û pêwendiyên edebiyatê bên dirêjkirin. Lê dema ku di teoriya edebiyatê de qala civatê tê kirin rexneya sosyolojîk û sosyolojiya edebiyatê tê pêşberî me. Bi gotina Moran (2012, rr. 83-86) rexneya sosyolojîk cara yekem wekî şêwazeke diyar ji aliyê Hippolyte Tain ve hatiye bikaranîn û di nirxandina dîroka edebiyatê de "nijad, derdor û serdem" hêmanên raveker in. Dîsa li gorî wî îro rexneya sosyolojîk pêş ve çûye, bi hin cihan ve dikeve qada sosyolojiya edebiyatê û rexnegir dikare ni-

vîskar, berhem, cure, dema nivîs û şert û mercan bêtir binirxîne. Xebatên sosyolojiya edebiyatê wekî gaveke pêşeng bi piranî navê teorîsyenê fransî Robert Escarpit nîşan didin. Dikare bê gotin ku ew di xebata xwe de li ser pêvajoya hilberîna edebiyatê radiweste û hêmanên wekî nivîskar, pirtûk, xwîner, girseya xwîneran, huner û bazirganî, weşandin û belavkirina berheman û hwd. ji aliyê rola civakî ve dinirxîne (Escarpit, 1992, r. 7).

Helbet di dîroka edebiyatê de berîdaniya civakî û têkiliya sosyolojiya edebiyatê mijareke kûr û piralî ye. Şen Altın (2017, rr. 46, 52) di derheqê sosyolojiya edebiyatê de bala xwe bi piranî dide şêwaza berheman û dibêje edebiyat tenê li gorî Escarpit bi pêwendî pêvajoya hilberîna berheman an jî li gorî hin rexnegirên Marksîst bi bergeheke îdeolojîk nayê sînorkirin; ji ber ku edebiyat geşedena xwe didomîne û li gorî rastiya civakî ya îroyîn diguhere. Ev yek ji me re nîşan dide ku rol û bandora civakî di qada edebiyatê de berfireh e û ji vê yekê wêdetir civat wekî avakerê edebiyatê ye jî. Li gorî Süphandağı (2018, rr. 281-282), çarçoveya sosyolojiya edebiyatê wekî dîsîplînekê heta niha bi zelalî nehatiye avakirin lê ev nêzîkatî di eslê xwe de li ser berhemeke radiweste bê di qada civakî de bi çi astî û bi kîjan pêkaran cih werdigire. Bi gotina wî di nav xebatên vê dîsîplînê de nêzîkatiyên wekî bandorên diyardeyeke civakî ku bi çi awayî di edebiyatê de cih werdigire, fonksiyonên berhemeke edebî ku guherina civatê pêk tîne yan jî li ser wê bandoran dihêle hene.

Li gorî Şan (2012, r. 166), ji destpêkê heta niha pirsgirêka binyadî ya xebatên sosyolojiya edebiyatê li ser daxuyaniya taybetî ya hevbandora edebiyat û civatê bûye. Loma meriv dikare bêje ku sosyolojiya edebiyatê di nav xebat û dahurandinên berheman de ji xwe re cihekî berfireh dîtiye. Coşkun (2012, rr. 265, 269) bi vî awayî dibêje sosyolojiya edebiyatê bi heyîna fonksiyona civakî ya edebiyatê tevdigere û yek ji nav rêbazên dahurandina berhemekê ji aliyê sosyolojiya edebiyatê ve ev e ku mijarên civakî di nav wê de bên tesbîtkirin. Bi gotina Ölçer (2023, r. 79), di dahurandina sosyolojîk a berhemên edebî de sedemên derbasdar hene ku ev yek eşkere ye û bi vê rêyê temsîlên civakî tên pêşberî me. Ev hemû nîşan didin ku civat yan jî sosyolojî hevparê edebiyatê ye. Loma di qada hunerê de rol û temsîlên wê di çarçoveya sosyolojiya edebiyatê de ji aliyê bicihbûna xwe ve giring e. Meriv dikare têgeha civatê di nav berheman de bi bikaranînên cur bi cur bîne holê ku bandor û taybetiya wê bibîne.

2. Eşîr, Kilam û Dengbêjî

Xuyabûna eşîrê û taybetiyên wê dikarin li ser hin diyardeyan bên şopandin. Dîrok û jiyana kurdan bi awayekî xurt vê yekê nîşan didin. Wekî mînak Mela Mehmûdê Bazîdî (2021, r. 38), di berhama xwe ya *Adat û Rusûmatname'ê Tewayifê Ekradiye* de ji bo kurdan qala qîmeta nesebê dike û dibêje pir kesên kurdan heta heft bavan navê ecdadê xwe dizanin, xizm û eqrebayetiyê winda nakin. Ji xwe di vegotinên devkî de qala eşîrê pir tê kirin. Kilam, çîrok û serpêhatiyên bi vî awayî taybetiya eşîrê dide ber çavan. Têgeha eşîrê, çawa ku çêkerê jiyanê ye wekî vê yekê di kilamên evîniyê,

pevçûnê, jiyanê û hwd. de ji xwe re şûnekê digire. Dema ku qala kilamên kurmancî tên kirin di herî pêşiyê de kilamên dengbêjî tên hişê merivan. Kilamên dengbêjan û mijarên wan wekî olanên jiyanê dikarê bên çestandin. Mijar û naverokên wan jî bi jiyana rast re gelek têkildar in (Yorğun, 2024, r. 43). Çifçi (2015, r. 119), li ser vê yekê kilamên dengbêjan gelekî cihêreng dibîne û dibêje hema bêje her tişt bûye mijara kilamên dengbêjan. Ji aliyê têgeha eşîrê ve di nav tesbîtên wê de hêmanên "şer, evîn, koç, jiyana rojane, mîr, beg, jin, bûk û hwd." balê dikişînin. Ji ber ku hêmanên rêzkirî, bi awayekî sirûştî dikarin di çarçoveya têgeha eşîrê de bên bicihkirin.

Kevneşopa dengbêjiyê di hest û fikr û civakiya kurdan de gelek giring e. Ev tradîsyon, bi hezaran salan e di dirôka kurdan de bi berdewamî û guherînan bûye malê hafîzeyeke kolektif (Subaşı, Yıldız & Kaplan, 2025, r. 890). Dînamîzma wê deng e û çanda devkî a yekem tê hesibandin (Alay, 2019, r. 54). Dengbêj, wekî navekî etno-spesîfîk û xwerû bi kurdî di nav xebatên li ser dengbêjiyê de pir caran tê îşaretkirin û wekî term û têgeheke sereke ya vê qadê tê şirovekirin û şixulandin û dîsa wekî hunereke kurdî a resen tê pêşkeşkirin (Delikaya, 2025, r. 235). Bi veguhestina Boyce (2025, r. 188) dengbêj hunera xwe di malên xanan de, û herwiha di nav gund û bajarokên piçûk de çê dikirin; stranên wan hemû şêweyên jiyana wan ên koçer di nav xwe de dihewandin. Li ser vê yekê dikare bê gotin ku hunera dengbêjiyê bi awayekî rasterast girêdayî jiyanê ye. Loma di jiyana kurdan de her çi hebe û hatibe jiyîn ew hatiye vegotin di kilamên dengbêjiyê de. Ev huner digel meriv, civat, cih, xweza, dem, kiryar û hwd. dikare wekî berhemên jiyanê bê hesibandin.

Li gorî Bulmuş (2018, r. 165), çawa ku dengbêj bûye dengê mirovên ji her aliyê civatê, di heman demê de bûye vebêjerê serpêhatî û nirxên hevpar ên civakî jî. Bi gotinên Karacan û Nayman (2014, r. 366), avahiya eşîrê li ser kevneşopa kurdan xwedî fonksiyoneke mezin e. Bi vî awayî şerên mezin di kilaman de bi mijarên keç, zevî û serdestiyê ve cur bi cur bûne û ji devên dengbêjan ve heta niha hatine gotin. Têkiliya têgeha eşîrê û kilamên dengbêjiyê ji aliyê himayekirin û nav û dengê eşîran ve jî bi hêsanî tê dîtin. Li gorî Gürür (2014, r. 107) di dengbêjîya kurdan de pergala patronajiyê bi serûber nebe jî gelek şair û dengbêj, ji aliyê hamiyên wekî mîr, axa û şêxan hatine parastin, li dîwan, meclîs û qesr û qonaxên wan hunera xwe îcra kirine, dîwanên xwe xwendine. Dîsa bi gotina Aslan (2019, r. 336), dema ku li Kurdistanê desthilatiya siyasî xurt bûye û rewşeke aram dest pê kiriye, di heman demê de wekî şair û nivîskaran, dengbêj jî bi xêra hîmayekirina malmezinan zêde bûne. Dîsa bi gotina vî lêkolînerî, dengbêjê navdar Evdalê Zeynikê dengbêjê Sirmelî Mehmed Paşayê eşîra Milan e. Ehmedê Fermanê Kîkî li cem Reşîd Begê Kîkî demeke dirêj dengbêjiya eşîra Kîkan kiriye. Karapetê Xaço li cem Filîtê Quto dengbêjiya eşîra Reşkotan kiriye. Ev yek jî ji aliyê icrakirina dengbêjîyê ve derfeteke xurt e û bi awayekî, têkiliya eşîr û dengbêjiyê dide ber çavan.

Dema ku em bala xwe bidin naverokên kilamên dengbêjiyê, em dibînin ku têgeha eşîrê digel peywendên cur bi cur tê pêşberî me. Hin kilam hene ku têgeha eşîrê tenê tê de derbas dibe û konteksa wê sînordar e, hin jî hene ku mijar û temaya wê

li ser eşîrê pêk tên. Eşîr, ji bo takekes û civatê hem wekî peyveke erênî hem jî wekî peyveke neyînî hatiye famkirin. Eger eşîr, bi roleke zordestiyê rabûye û ji bo takekes û civatê dijwarî çêbûye vê çaxê di kilaman de wekî peyveke neyînî hatiye bikaranîn. Eger wisa nebe îcar di hiş û dilê merivan de wekî peyveke erênî ji xwe re cih girtiye. Korkmaz (2023, r. 36), bi çavên civatê, ji aliyêkî ve meşrûiyeta mîrên eşîrê, ji aliyekî ve jî neyîniyên wan diyar dike. Li gor wî dad û xweşbîniyên mîran tevgerên baş in, rûdanên nexweş ku ji sedema nepêşbîniyê ne tevgerên ne baş in. Di herî pêşiyê de eşîr bi têgeha hêzê ve tê nasîn. Di nav civata xwe û navbera civatan de bandora hêzê nayê înkarkirin. Hêz, li vir erkên duhêlî dihewîne û xwedî danekirinê ye. Dibe ku hem bibe çêkerê çêyiyê hem jî bibe sedema xerabiyê. Loma têgihiştinekê digire ser xwe, li gorî peywenda xwe diguhere. Ev peywend jî bi têkiliya kes û kes, kes û malbat, kes û civat an jî civat û civatê xwe nîşan dide. Danekirin jî eger bi zordestî bê kirin, li ser kes û civatan bandoreke nexweş dihêle û di navbera kes û civatan de şer dest pê dike. Yan jî nakokiyeke veşartî ji xwe re rêyekê dibine. Kilam jî bi rêya hunerê ve wekî olana rûdan û rewşên berbehs dibe derfetek. Bi awayekî reaksiyoner xwe nişan dide û piştre dibe wekî parêzgeha kes û civatan. Ji aliyê din ve ji bo rewşên cur bi cur jî dibe motîvasyoneke taybet a hunerî.

3. Ji Aliyê Sosyolojiya Edebiyatê ve Bikaranîna Têgeha Eşîrê di Kilamên Dengbêjiyê de

Kilamên dengbêjiyê, di xebata Güneş û Şahin (2021a, r. 18) de jî diyar e ku di bin pênc sernavan de dikarin bên senifandin. Li gorî vê yekê kilamên dengbêjiyê wekî yên serhildanê, evîniyê, li ser şer û pevçûnên navxweyî-eşîrê, li ser xweza, raman û jiyanê û destanê ne. Hatiye dîtin ku têgeha eşîrê bi piranî di kilamên serhildanê û şerên eşîran de derbas dibin. Têgeha eşîrê tê dîtin ku li ser serokên eşîran, paşa, mîr, axa û kesayetên navdar û malên eşîrê tê vegotin. Di van kilaman de naverok û şahidiya rûdan û qewimandinên cur bi cur, li hemberî hêzên hikumetê, eşîran û xwedî otorîteyan digel têkoşîna eşîr û kesên navdar û hwd. tên veguhestin û xwiner wan wekî metnên bîranîn û qeyda dîrokî dixwînin. Kilamên din jî têgeha eşîrê ji aliyê mijara eşqê û têkiliya destgirtî û hezkiriyan ve dihewînin lê bi awayekê siruştî meriv dikare bibêje ku otorîteya eşîrê di nav mijarên siyasî û civakî de zêde peywendîdar e.

Mijarên ku bûne naveroka kilamên dengbêjiyê û temayên van kilaman bi rastî jî rasterast têkildarî civakê ne. Jixwe hêmanên serhildan, pevçûnên eşîran, kesayet û serokatiyên eşîran, nakokiyên di navbera eşîr û serdestan de û li hemberî wan têkoşîn û hwd. di çarçoveya civakî de taybet in. Kilamên xweza, evînî û hwd. jî dikarin têkildarî civatê bên dîtin. Bi gotina Delikaya û Ertekin (2021, rr. 22-23) kilam di navbera meriv û mekanê de pabendî û aidiyetê çêdikin û wekî mînak kilama Eli Xarza ji aliyê hewandina navê cih û waran ve li ser qewam û tevgerên civatî radiweste û li ser cihan hest û bîranînan saz dike. Dîsa li ser vê yekê Delikaya (2024, r. 34), dibêje ku dengbêj wan cih û warên ku lê qewimînên trawmatîk pêk hatine dixe bîra civakê û şîna kesên mirî dike, bîranîna wan kesan di bîreweriya civakî de tomar dike.

Ev hemû ji me re di qada sosyolojiya edebiyatê de şewqdana civatê û jiyana wê nîşan dide. Ji ber ku li aliyekî bi kilamên dengbêjiyê huner û edebiyat heye li aliyekî jî naverok bi hêmanên civakî hatine honandin. Li gorî Escarpit (2012, r. 69) nirxên hunerî bêyî têgihiştina rast û potansiyel a gel nayê fikirîn. Ev yek ji me re nişan dide ku nirxên hunerî û gel peywendîdarên hev in. Dîsa bi veguhestina Alver (2012, rr. 18-19) "şewqdan, vegotin-veguhestin û avakirin" bo nîşandana aliyên cihêreng ên edebiyatê bikêr e û wextê "hêlî" û "şewqdan" wekî hêmanên sereke bên şopandin derfeta sosyolojîk a edebiyatê bi zelalî tê dîtin. Kilamên dengbêjiyê jî tam bi vî awayî derketine holê û hem wekî şewqdana jiyanê ne hem jî bi îcrakirina dengbêjan kiryarên vegotin-veguhestin û avakirinê ne.

Ji aliyê din ve kilamên dengbêjiyê bi piranî li ser jiyîn û tecrubeyên rasteqîn in. Herçiqas berhem û metnên honakî jî şewqdanên civatê dihewînin, ji ber ku naverok û rolên civakî bi eşkere tê dîtin kilamên dengbêjiyê di vî warî de xwedî taybetiyeke xurt in. Li gori Soykan (2009, r. 14), di dahurandina berheman de ji aliyê sosyolojiya edebiyatê ve du neqşe hene; yek "neqşeya edebî" ye ya din jî "neqşeya objektîv" e. Ji aliyê rûdan û pêkanînan ve ev her du yan li hev digirin yan jî ji hev cuda dibin. Ji aliyê rasteqîn û jiyînê ve ev yek tê nirxandin. Li gorî vê yekê dikare bê gotin ku kilamên dengbêjiyê bi piranî li ser jiyîn û rûdanên rasteqîn hatine hole. Bi nîşandana Yorğun (2024, r. 43), mijar û naverokên kilaman têkildarî jiyana rast in. Loma di kilamên dengbêjiyê de neqşeya objektîv û neqşeya edebî li hev digirin. Ev yek jî têgeha eşîr û bandorên wê yên li ser kilamên dengbêjiyê ji aliyê sosyolojiya edebiyatê ve ji me re bi awayekî xurt nîşan dide.

Kösemihal (1964, rr. 12, 27) jî qadên sosyolojiya edebiyatê bi çar sernavên sereke yên wekî "nivîskar", "berhem", "weşandin, belavkirin, sazî û komele", "girseya xwîneran" rêz dike û bi hûrgilî li ser wan disekine. Di bin van sernavan de jî hin binsernavan pêşkeş dike û taybetiyên wan ên civakî dinirxîne. Kilam û avahiya dengbêjiyê dikarin li gorî sernav û binsernavên berbehs bên têkildarkirin. Wê çaxê em dikarin "dengbêj"ê têxin şûna "nivîskar"ê û li gorî vê yekê hêmanên wekî "dengbêj di nav civatê de", "dengbêj di nav dema xwe û serdeman de", "dengbêj digel nifş û ekolên din", "herêma dengbêjê", "dengbêj û komên civakî" û hwd. rêz bikin. Sernava "berhem"ê jî dikare wekî "kilam"ê bê hesibandin. Di bin wê de qala "sosyolojiya mijaran" tê kirin ku ev yek "têkiliya mijaran bi civat û koman re" dihewîne. Dîsa tîp û karakterên civakî yên wekî hêmanên naverokî "axa, mîr, paşa…" di vê gavê de balê dikişîne û "cure û şêweya kilaman" û hwd. jî bitaybet dixuyên. Helbet kilam û saziya dengbêjiyê li gorî sernava "weşandin, belavkirin, sazî û komele" xwedî naverok in û ji aliyê sosyolojiya edebiyatê ve cih û taybetiya wan nîşan didin. Li vir rola "xwîner" jî wekî "guhdar" an jî "şopîner" dikarin bên diyarkirin û li gorî guhertinên demkî bên nirxandin û şîrovekirin.

Soykan (2009, rr. 13-14) bi xebata xwe ya li ser ceribandineke rêbaza tetbîqkirina sosyolojiya edebiyatê balê dikişîne ser çar sernavên wekî "cih-dem, derxistina taybetiyên kesayetên giring, honandina rûdanê û peyamê." Herçiqas di xebata xwe

de li ser romanan bisekine jî ji bo berhemên dengbêjiyê jî hin naverok derbasdar in. Meriv dikare têgeha eşîrê bi têkiliya civakî bêtir di bin sernavên "derxistina taybetiyên kesayetên giring û peyam"ê de digel temsîl û wateyên wê binîrxîne.

Em dikarin bikaranîna têgeha eşîrê di kilamên dengbêjiyê de li gorî van tesbîtên jorîn bînin zimên. Ji ber ku eşîr di nav jiyan û hunera kurdan de rastiyeke berpêş e. Şewqdan û bandorên wê li ser vê yekê jêneger in. Hem famkirina taybetiya kilam û dengbêjiyê hem jî ya têgeha eşîrê di çarçoveya têkiliya jiyan, huner û civatê de bi vî awayî berbiçav in. Ev hemû nîşan didin ku eşîr bi awayekî rasterast têkildarî civatê ye û di qada sosyolojiya edebiyatê de li gorî vê taybetiya berbiçav wateyên cur bi cur dihewîne.

1.1. Dab û Nerît û Qeydeya Eşîrê li Hemberî Xerabiyê

Kilama "Elîfê, Emînê-Ûskan-", kilameke li ser pevçûna eşîran e. Elifê û Emînê piştî şerê bi hev re diçin ba Bişarê Çeto ji bo cinazê Îskan ê birayê xwe û aqubetê jê dipirsin. Di nav vê lêpirsînê de qeydeya eşîran di nav şerî de jî xwe xuya dike. Ev çûyîn û serlêdan ji hêla din ve dab û nerît û rêzikên civakî yên eşîrê di nav camertiyê de nişan dide. Qeydeyên eşîrê di vê mînakê de li hemberî "eybeke mezin" tê lêgerîn. Ev yek di rêza "eyba mezin ew e merû hevalê xwe bikuje bê cinazê havale xwe veşêre" de xwe nîşan dide. Dengbêj, bi devê jinekê qeydayeke civakî ya giring vediguhêze. Herçiqas şer û pevçûn biqewime jî divê teslîmkirina cinazan pêk bê. Li vir meriv dikare bêje dab û nerîteke civakî di kilameke dengbêjiyê de dibe meramek. Ji aliyê kilamê ve edebiyat û ji aliyê dab û nerîtê ve jî taybetî û rola sosyolojiyê digihîjin hev. Ji aliyê din ev kilam li ser veguhestina jinekê tê vegotin. Li gorî Filiz (2021, r. 53) di nava sosyolojiya eşîran de jin hem ji aliyê erênî hem jî ji aliyê neyînî li ser rolên cuda hatine dîtin û dikare bê gotin ku carna helqeya herî lawaz jin bûye û ji olana têkoşîna desthilatiya civakî û çandî re şahidî kiriye. Tê dîtin ku di vê kilamê de şahidiya jinan heye:

"em digerin nagerin cinazê Îskan ê birayê me tunîne
apo ezê bi qebra bavê te kim
ji berê da tim û daîm eşîra mêra, mêra kuştine
lê kuştina mêra tu cara li eşîra eyb û ar tunîne
eyba mezin ew e merû hevalê xwe bikuje bê cinazê havale xwe veşêre
cinazê xweşmêra li orta meydanê bê xweyî bê xwedan bimîne" (Güneş & Şahin, 2021b, r. 276).

Di kilamê de di beriya "eyba mezin" de "kuştina mêran" wekî kiryareke normal a eşîran tê dîtin. Li vir jî meriv dikare bêje pejirandineke civakî xwe nîşan dide. Çimkî kuştina mêran "bê eyb û ar" tê nîşandan. Li gorî dema vegotin û veguhestina vê kilamê taybetiya civata kurdan û qeydeyên wê tê pêşberî me. Îroj jî di nav civatê de tolhildan, heyfgirtin û kiryarên bi vî awayî ji bo hin kesan li hemberî zagonan wekî rêyeke rast tê dîtin. Loma meriv dikare bêje di navbera civat û mieyîdeya zagonê de nakokî heye. Lê di atmosfera vê kilamê de dem, cih, rolên kesayetên berbehs û

meram ji me re zagoneke din a civatê nîşan dide. Helbet bi guherîna dem û cih û bajarîbûn û hwd. ev yek jî diguhere.

Di kilamê de Bişarê Çetojî jî ji wan re dibêje "ti carî hay û gumana tivinga min ji birayê we tunîn" û wan dide berhêlîkirina Emê Bozê û pişt re Hesenê Ozman. Herdu xwang, îcare diçin cem Emê Bozê û heman bersivê ew jî ji dide wan û dawiyê ew diçin cem Hesenê Ozman. Piştre şûna cinazê birayê wan diyar dibe. Gotina Hesenê Ozman jî tevgara eşîran nîşan dide:

"li kozika pişta qesrê cinazê İskanê birayê xwe bibîne

İskanê birayê te mêrekî heyf e, bira cinazê birayê te li erde nemine" (Güneş & Şahin, 2021b, r. 278).

Tê dîtin ku dab û nerît û qeydeya eşîrê di dema şer û xerabiyê de ji bo vegotinê dibe navbeynkareke avaker. Dikare bê gotin ku dengbêj motîvasyona xwe ji vê taybetiya civakî werdigire û dab û nerît û qeydeya eşîrê bi rêya hunera vegotinê bi bîr dixîne. Ev yek dikare di çarçoveya sosyolojiya edebiyatê de rolên civakî nîşan bide.

1.2. "Nava Eşîra" Wekî Sedema Biryar û Tevgeran

"Nava eşîra" gelekî caran di kilaman de derbas dibe. Ev gotin, wekî olaneke jiyana kurdan a civakî dikare bê dîtin. Ji ber ku biryar û tevgera merivan piranî li gorî gotin û bandora eşîran ve tên eyarkirin. Li vir eşîr otorîteya xwe nîşan dide. Eger em naverokên kilaman wekî olanên jiyanê bibînin wê çaxê tê famkirin ku "nava eşîra" bi pêwendî têkiliyên civakî hêmaneke kiryar e. Carna wekî pejirandina biryar û tevgeran e, carna wekî sedem e ku tiştek dê bê kirin yan jî dê neyê kirin û hwd. Ji aliyê sosyolojiya edebiyatê ve li hemberî me otorotiyeke mezin derdikeve ku ev yek eşîr e. Tê zanîn ku metnên honakî li ser nakokiyan tê avakirin. Hêleke wê wekî daxwaz, birêketin û meşandina serboriyên xwe ye, hêlek jî wekî asteng li hemberî wê ye. "Nava eşîra" bi vî awayî di kilamên mînak de rola xwe ya civakî pêk tîne û ji aliyê erênî yan jî neyînî beralîkirinê dike. Di edebiyatê de serleheng an jî kesayatên cur bi cur li pey armancên xwe dikevin rêyekê. Carna ew mecbûr dimînin ku bi pêwendî civatê bin an jî pê re nakokiyan bijîn. Takekes û civat, em bêjin digel fokûsa "nava eşîra" yan bi beşdarbûn an jî bi ciyawazî encamê werdigire.

Di kilama "Seîdo Tu Axa yî" de têgeha eşîrê wekî sedema biryar û tevgeran tê vegotin. Ji ber ku "nava eşîra" ji bo şan û şerefa eşîr û kesan otorîteyeke giran dihewîne. Eşîr, li vir ji bo domandina jiyaneke civakî mecbûrî ye. Loma jî dibe sedema çareseriya pirsgirêkên takekesî û civakî. Rola eşîrê dikare bê gotin ku li vir wekî di nav biderfetî û bêderfetiyê de ye. Ne bi eşîr ne jî bê wê nabe û ev yek ji aliyê avahiya civakî ve wekî nîşandana rewş û jiyana kurdan e. Di kilamê de bi vî awayî tê dîtin ku daxwaz û lêgerîna mîrekî nû tê vegotin û ev biryar û tevger wekî çareseriyekê xilasbûna eşîrê ye. Dîsa di vê kilamê de eşkere dibe ku ji aliyê sosyolojiya edebiyatê ve ev mijar, mijareke civakî ye û di nav berhemeke hunerî de ye. Ji hêla din ve rolên civakî yên wekî axa, endamên eşîrê û xelk di vê berhemê de bi wate û taybetiyên xwe

cih digirin. Ev dikarin di çarçoveya hêmana tîp û karakterên civakî an jî taybetiyên kesayetên giring û temsîleke civakî de bên hesibandin û ji şewqdana civatê ve tên:

"ez neketime kuştina mêran û xweşmêra

kuştin kuştina mêran e

leg ezê ketime wa ber vê heyrê

wele tirsa min ê ji wê tirsê ye

sibe xelkê di nava eşîra Reman û Reşkotan li hevdu rûnên

wê bibên berazanî sakî gamêşa rabe gamêşê hêl bikuje

…

emê ji xwe re li nava eşîra Reman û Reşkotan bigerin

emê yekî mîna bavê Ehmedê xwe lawo ji ku rakin

emê li nava eşîra Reman û Reşkotan mîna caran lawo ji xwe re bi axa kin" (Güneş & Şahin, 2023, rr. 142-143).

Kilama Rizgar û Nûrê kilameke evînî ye lê pêwendî şert û mercên civakî ye. Di kilamê de vegotin li ser Nûrê ye û behsa evîniyeke bêderfet tê kirin. Nûrê ji bo parastina hezkirîyê xwe Rizgar dixwaze ku xwe bike qurban. Ji bo vê yekê jêkirina poz û guhên xwe ji Qoço dixwaze da ku di "nava eşîra" de derheqa wî de xirabî neyê gotin. Nûrê bangî birayê xwe Qoço dike û ev bang di nava civakê de rola eşîran nîşan dide. Têgeha eşîrê li vir wekî roleke serdestiyê ye û bi neyînî hatiye bikaranîn. Li ser qedera destgirtiyan otorîteyeke sînorkirî ye. Dibe sedema biryara derheqê wan de. Ji hêla civak û malbata Nûrê ve jî ev rol wekî erênî tê dîtin. Ji ber ku ji bo domandina namûs û şan û şerefê "nava eşîra" cihê pejirandinê ye:

"ez çûme pêşiyê mi go Qoço ez bi bextê te ketime

teniya sacê mi di rûyê xwe daye, sebeba Rizgo ez im.

lawo derbekî li mi bide li Rizgan mede, poz û guhê mi jêke

bi cêva xwe ke, nava eşîra da bigerîne

bila herkes mêraniya te bi çavê xwe bibine" (Güneş & Şahin, 2019, r. 118).

Kilama "Meyayê", kilameke evîniyê ye. Bi awayekî devjenî hatiye vegotin. Leckirina kur û keçê, têgeha eşîrê ji me re digel tevgereke wêrektiyê nîşan dide. Ji ber ku girtina ramûsanekê ji keçikê li hemberî "nava eşîran" tê kirin. Ev yek hem giraniya eşîrê hem jî li gorî daxwaza kurikî wekî tiştekî hêsan tê bikaranîn. Lê wekî xetere jî tê vegotin. Li vir rola eşîrê bi dijwariya xwe derdikeve holê û nakokiya takekesî û civakî şênber dibe. Ji hêla din ve dengbêj dizane ku daxwaza ramûsanekê ji keçikê li hemberî eşîrê peyaneke ceribînê ye da ku hem camêrtiya wî hem jî hezkirina wî ya diberdanî bê dîtin:

"dilê mi Eyşan Xanim qîza Melîkê Ûrfiyan e

ez îro ji erdê Silîva rêketim hatim derketim Kîkan û Mila

ji bona xatirê nefsa canê te ez îro

di nava eşîra Kîkan û Mila ramîsanekê ji te bistînim

bi destê zorê serbarê nerm eyar e heyrano" (Güneş & Şahin, 2019, r. 132).

Di kilama "Keremê Qolaxasî" de "nava eşîrê" li pey encamên şer, ji bo rewşên nebaş ên mixtemel têkildar hatiye dîtin. Bi vî awayî rola eşîrê wekî pêximker hatiye pêşkeşkirin. Ev yek wekî yên din, bikaranîna "nava eşîrê" di civata kurdan de dike hêmaneke biqîmet. Ji aliyê sosyolojiya edebiyatê ve li vir peyameke civakî tê dîtin. Ev peyam qeydaya eşîrê bi bîr dixîne da ku rûdanek an jî rewşeke nebaş pêk neyê:

"gere eskerê Heyder Efendî vê sibengê ji xwe ra li ser esker nesekine

ez ji te re sond bixwim gere nava êlan û eşîran da

serî jî îro şunda ser xwe negire" (Güneş & Şahin, 2021a, r. 101).

Kilama "Bavê Mîr Begê Min" li ser girtina mîrê eşîrê tê vegotin. Di vê kilamê de girtina Bavê Mîr Begê di nav eşîrê de wekî tiştekî giran tê diyarkirin ku ev yek ji mirinê wêdetir tê dîtin. Wekî şikandina şerefa mîr û eşîrê tê diyarkirin. Ji ber ku şan û şerefa mîrekî herçiqas bê girtin jî di nav eşîrê de her tim heye. Loma şahidiya giritina wî di nav roj û qîz û bûkan de wekî rewşeke xerab tê dîtin. Kesayetên mezin û navdar herçiqas di nav civatê de bi awayekî bêqisûr bên dîtin jî helbet jiyanên wan ên taybet jî hene. Lê ev yek di nav mal û malbatê wan û jiyanên wan ên taybet de veşartî ye. Loma kesayetên mezin û navdar bi piranî di hişên merivan de bi pesinandin û girisandin bi cih in. Dema ku ev kes di roja teng de wekî merivekî normal an jî wekî her kesî bên miameledîtin wê çaxê ev kiryar ji bo civatê tiştekî giran tê hesibandin:

"xwezil navê mirina Bavê Mîr Beg bihata nava eşîra Xweytî ye

destê Bavê Mîr Begê min kelemçe nekirana

nava qîz û bûkê eşîra Xweytî ra derbas nekirana bi navê ro ye" (Güneş & Şahin, 2021a, r. 88).

Gotina "nava eşîrê" di kilamên mînak de diyar e ku ji bo takekes û civatê giring e. Ev gotin di kilamên mînak de hem bi dubarebûna xwe ve hem jî bi sedembûna tevger û biryaran tê dîtin. Wextê dengbêj vê gotinê bi kar tîne bandora eşîrê xwe nîşan dide. Di çarçoveya sosyolojiya edebiyatê de meriv dikare di vê bikaranînê de hevbandoriya edebiyat û civatê û şewqdana civakî bibîne.

1.3. Bikaranîna Hejmara Eşîran û Wateyên Cur bi Cur

Hejmara eşîran di kilaman de pir caran tê bikaranîn. Dikare wekî peyvekî qalib ji bo xurtkirina wateyê bê dîtin. Di mînakan de qalibên wekî "bist û çar eşîr", "donzdeh eşîr" û hwd. li gorî naverok û veguhestinê dikeve rêzê. Ev yek hem wateyên civakî hem jî yên takekesî dihewîne. Zêdebûna hejmara eşîran mijar û rewşên vegotî jî giringtir dike. Ev yek dikare wekî şewqdana civakî ya eşîran bê hesibandin.

Di kilama "Delêl" de têgeha eşîrê bi têkiliya yarê tê bikaranîn. Rûmeta yarê bi zêdebûna der û tiştên ku di kilamê de derbas dibe li ser gerîn û şibandinan xwe nîşan

dide. Hejmara eşîran wekî "bist û çar", "donzdeh" û hwd. tê bikaranîn û li pey vê yekê pesn û xemla yarê û dûrketina ji wê tê zimên:

"bê Delal Delal Delal…

…

meskenê esmer û zeriya

wele konê Bavê Edlê dîrega Kurdistanê çiviya dunyayê

benda bîst û çar eşîra bi kela neyêr e

Delal di pê re bira şewq û şemaliya vê stêrkê" (Güneş & Şahin, 2023, rr. 63-64).

Hejmara eşîran di kilama "Delêl" de, di vegotineke din de jî ji bo pesn û xemla yarê tê bikaranîn. Hejmara eşîran zêde ye, "bavê donzdeh eşîran e" jî xurtbûna mixatabê xwe nîşan dide. Lê ev yek li hemberî xwedîderketina wî ya li destgirtiya xwe, bi awayekî dijrabertî dibe tiştekî hêsan:

"Delêl dilê min da pir ezîz î, pir şêrîn î

…

te nadim Ehmed Begê Rihalî mêrikî bavê donzdeh eşîran e

bi şev bi roj çay û qehwa xwe bi destar dihêre

te nadim lawê Îbrahîm Paşa Mîrê Milî" (Güneş & Şahin, 2021a, r. 117).

Di kilama "Nêçîrvano" de jî hejmara eşîran "bist û çar" in û hemû ji bo bedewbûn û xweziya keçikekê tevdigerin. Dengdayîn ji aliyê keçikê ye û ji kurikî re bi vî awayî pesnê xwe dike:

"dêrisê gundê me de bîst û çar eşîr in

lo lo oy oy oy lo segvano

tu nizanî seb xatirê çav û buriyê min ê reş û belek ketini dawê" (Güneş & Şahin, 2021a, r. 415).

Di kilama "Nemînim ji Axê ra - Bavê Cemîl" de ji bo xurtbûna eşîrê tê bikaranîn. Bi awayekî siruştî zêdebûna hejmarê dibe xurtbûn û nifûza eşîrê:

"axao neminim ji axê ra

ji bavê xanimê kekê nîgarê ra

ji gula govendê, siwarê çîçekê ra

ji mêr û mêrxasê binê lengere di erdê ra

ji timtêla axê ra ji bavê donzdeh eşîrê deşta Surucê ra" (Güneş & Şahin, 2021a, r. 463).

Di kilama "Mamed Axa û Bekir Begê" de jî hejmara eşîrê di nav amadekariya şerî de tê bikaranîn. Digel gefxwarina mîran "donzdeh" eşîr tên berhevkirin:

"sêr bike li cimaeta dorê kir qêrîne

Li def û hewarê dixîne donzdeh eşîrê xwe berhev dike

Hezar û pênsid çaqmaqî xwe bi ser da tîne

Ji êvar da çadir dikute, hêwîr datîne" (Güneş & Şahin, 2021a, r. 472).

Hejmara eşîran carna berfirehiya wan nîşan dide. Eşîr di nav xwe de giredayî hev in û ev yek avahiya civakî dinasîne:

"ji me re dixwazin herbekî bed girane

Serê bîst û çar eşîrê Mila di ber da mane" (Güneş & Şahin, 2021a, r. 570).

Eşîr, hêza eşîrê ya leşkerî û siwarî jî carna bi hejmaran tên nîşandan. Li vir zêdebûn bi awayekî sirûştî têkildarî hêzê ye. Hêza eşîrê digel hejmara kesan, leşkeran, derfet û siwaran, berfirehiya herêm û gundên ku li ser dijîn, têkiliya eşîrên din û hwd. tê holê. Loma di şer û parastina xwe de hejmara leşkeran û amedebûna wan giring e. Dikare bê gotin ku li ser hêza civakî vegotineke epîk jî pêk tê. Ev yek ji aliyê sosyolojiya edebiyatê ve temsîl û wateyeke lehengî nîşanî me dide.

Di kilama "Bavê Xalis Kekê Mexsê" de, şerekî li hemberî Ûrisan tê vegotin. Eşîr di nav amadekariya şerî de bi hêzên xwe tê pêşkeşkirin:

"vê sibengê ordiya kafirê Ûris li pêşiya me ji xwe re dimeşiya

ketiye gelo vê sibengê kapanê Elcewaz

…

tu dêhna xwe bide vê sibengê li milê me yê çepê esker e eskerê Hesanan e

li milê me yê rastê vê sibengê eskerê Kor Husên Paşa

donzdeh alay e eskerekî pir giran e

…

vê sibengê apo tu bang neke eşîrê di Kurdane

…

di nav xwe de bêje va hicûm hicûma mêrê di Sîpka ne" (Güneş & Şahin, 2021a, rr. 84-85).

Di kilama "Bavê Fexo" de jî hêza eşîrê bi siwaran xuya dibe. Di nav sêwirandineke lehengane de siwar tên vegotin:

"mi dî tîpê siwarî eşîrê vê sibengê ji binê xetê derketin

li xeta Frensiz, Amûda şewitî, newala Qamîşlokê, Hemidgolê biniya Xetê," (Güneş & Şahin, 2021a, r. 135).

Li ser van kilamên mînak, ji ber ku di vegotinê de wateyê xurt dike, dikare bê gotin ku hejmara eşîran yan jî zêdebûna kes û siwaran ji bo civatê temsîliyeta hêzê ye. Ev rewş ji aliyê sosyolojiya edebiyatê ve rola civakî nîşan dide.

1.4. Feydeyên Civakî yên Eşîrê

Di nava civata kurdan de ji bo domandina jiyanê rola eşîrê berbiçav e. Ji aliyê debar, ewlekarî û hwd. ve rolên cur bi cur tên dîtin di kilaman de. Li ber rewşên tengasîyê eşîr û derfetên wê yên bi vî awayî xwe nîşan didin di fikr û hestiyaran de.

Li vir eşîr ji aliyê sosyolojiya edebiyatê ve rolên xwe yên civakî û siyasî nîşan dide. Li ser dengdayinê peyam tê ragihandin û eşîr bi temsîla jiyanbar wateya xwe werdigire.

Di kilama "Geliyê Zîlan" de eşîr, bi peywendiya siyasî tê bikaranîn. Di kilamê de ji ber zordariya ferman û qanûnan neçariya kurdan û rewşên nebaş tê vegotin. Eşîr, li hemberî zordariyê wekî penahîgeheke xwebûnê ye. Der û dewerek tune ye gel biçe û xwe xelas bike. Ji ber vê yekê dîsa welatê Serhedê cihê eslî û beridayînê ye û bi vî awayî eşîra kurdan dibe deriyê "av û rizqê". Eşîr di vê mînakê de wekî hebûnekê ye lê hêz û xîreta xwe ji windakirinê ve digire:

"ez dizanim heya sax û silamet bim di nava eşîrê da vê sibêngê
derd û kulê me bi serê Geliyê Zîlan be
…
tu rabe emê berê xwe bidine welatê Serhedê
av û rizqê me bira dîsa li nava eşîra Kurda be" (Güneş & Şahin, 2021a, r. 49).

Ev kilam di vegotineke din de jî vê rewşa xerab tîne zimên. Dengbêj, dîsa li ser heman mijarê radiweste û têgeha eşîrê bi vî awayî derbas dibe:

"Hacê digo Huco Fêrîdê lawo sibe ye qalek çêbiye îro ser eşîra Geliyê Zîla
Warê Salih Begê, Zozanê Sûtê, Kaniya Dîdarê, li delavê Hêrîşoyê
reben ez im lawo qewimiye li orta Herdu rêyan e/heyfa mi nayê li qira Geliyê Zîla
…
Hacê digo Huco Fêrîdê lawo ez neminim ji kê ra
nizanim bigirîm ji halê kîjan eşîrê ra" (Güneş & Şahin, 2019, r. 48).

Qîmetzanîna eşîran wekî fêrbûna şêwaza civata kurdan e. Ji ber ku avahiya civata kurdan heta niha bi eşîran pêk hatiye. Eşîr bi xwe bi têkildariya hêmanên civakî wekî rêvebirên jiyanê hatine dîtin. Helbet rolên xerab jî wekî tiştên din li ser eşîran pêk hatine. Lêbelê di hin cihan de xwedîlêderketina eşîran rola wê ya biqîmet nîşan daye. Ev xisûs, exlebî di kilaman de hatiye vegotin û rolên civakîyên eşîrê wisa berpêş bûne.

Di kilama "Hêdî Bajo Mîro Fermanlî ne" de ji qîmeta eşîra Milan re bal tê kişandin. Terikandina eşîrê wekî tevgereke neyînî tê dîtin. Ev, ji aliyê sosyolojiya edebiyatê ve hem rola civakî ya eşîrê dide xuyakirin hem jî peyameke civakî pêşkeş dike:

"Hela mîrê mino keko yawaş bajo melezine
hela tu yê dizgîna Sêlo tu yê ragire meleqîne
le eşîra Milanê Kibîr giran e meterkîne
…le tu yê eşîrek mîna eşîra Milanê Kibîr hay lo Mîro ji ku bîne" (Güneş & Şahin, 2023, r. 35).

Gazikirina eşîran, di nav civatê de ji aliyê hişyariya rewşên xerab û giran giring e. Eşîr, di civata kurdan de xwedî otorîte ye û loma jî gazikirina wan bi vî awayî tê çend

wateyan. Alver (2012, r. 13) dibêje nivîskareke endamê civatek e û di nav wê de bi navbeynkariya têkildarbûn û ragihandinê nasname û zimanê xwe dibîne, ji me re derfeta xwendina sosyolojîk a edebiyatê nîşan dide. Kilama "Mala Ûsivê Seydo-Seyîdxan-", kilameke serhildanê ye. Ji bo rewşa xerab wekî banga camêrtiyê ye. Loma di nav bang û gazinê de tê vegotin ku "çira eşîra vemiriye." Li vir eşîr di nav wateya daxwaz a piştgiriyê de tê bikaranîn:

"hela lêxin bavê mino/çira eşîra vemiriye
ay de bavê mino siwar bin
eger siwar nebin werin kar û bar bin
law nîşan lêxin di ava Mûradê de derbas bin
merin mala Feqîr Kose
sala îsal ewê ji me re nifirkar be" (Güneş & Şahin, 2023, r. 44).

Kilama "Îbrahîm Paşayê Milî", ji bo piştgiriya İbrahîm Paşayê Milî (Bavê Evdilhemîd), gazîkirina eşîran dike:

"bavê mino rabe xwe berde nava Rihaliya,
Mendeliya, Duderiya, Qeregêçiya
bişîne kehêla, manegiya, hidûdiya, seglawiya
bi sê denga li koşka Husêynê Qenco bike hewar û gazî
ew jî eşîra Milan e de rabe Hakimo ho ho" (Güneş & Şahin, 2021b, r. 63).

Di Kilama "Şerê Gola Gulê" de eşîr wêkî şahidan tên bikaranîn. Ji ber ku giraniya şer bê dîtin û ji vî aliyî ve hişyariyek çêbibe:

"Gelî bira sibe bû ezê li dîharê Gola Gulê diketim
dilê min û te ra dar û rez e
mi dî şivan û gavanê gola gulê jêliv têne bi gazin û wa bi lez e
go gelî êla metîna jêliv werin gelo vê sibengê şer e
birano şer e, keko şer e, xweyîno şer e
vê sibengê êl û eşîra girano şer e" (Güneş & Şahin, 2021a, r. 461).

Eşîr, carna jî ji sedema bêkêriyê ve tê rexnekirin. Eşîr di destana "Dewrêşê Evdî" de li hemberî lehengiyê tê rexnekirin ku di nav bêkêrbûnekê de tên sêwirandin. Hemû kom bûne lê ji bêkêriyê di nav kêf û aramiyekê de ne. Her çiqas eşîr bi giraniya xwe bên diyarkirin jî vegotin bi awayekî rexneyî ye. Rexneya civakî dikare wekî mijareke sosyolojiya edebiyatê bê dîtin. Ji ber ku tevgerên eşîran wekî şewqdana civakî di kilamên dengbêjiyê de bicih bûne:

"bîst û çar eşîrê giran li konê giran li hev civiyan e
bi şev û bi roj dixwin goştê hilika birince ser siniyan e
bûyir bûyirê qehweçiyan e
fincana bilind dikin bi du tiliyan e

bi ser xwe de diqlibînin bi du gulman e

…

gidî gelo virevirê kurdan e

ji xwe re di ciyê xwe de rûniştine

her yekî pesnekî li xwe dane" (Güneş & Şahin, 2021a, 567).

Tê dîtin ku eşîr di kilamên mînak de bi rolên xwe yên civakî kêrî civatê tê. Loma bêyî wê jiyan nayê fikirîn. Bendewariya civatê bi piranî li ser eşîrê tê zimên. Feydeyên eşîran ji aliyê sosyolojiya edebiyatê ve dikare di çarçoveya mijar û naverokên civakî, rolên civakî û şewqdana civakî de bên nirxandin.

1.5. Eşîr Wekî Sedema Girtin û Kuştina Mêran

Şer û pevçûnên eşîran tê zanîn. Di van şeran de dikare bê gotin ku kuştina mêran wekî rewşeke jêneger e. Ji berê ve di navbera eşîran de ev yek di mêja eşîran de hem ji bo pesnandina xwe hem jî ji bo heyfgirtina xwe hatiye bikaranîn. Kilam û nerîta dengbêjyê jî bi piranî li ser rûdanên mezin radiwestin. Loma jî bandorên vê yekê tên dîtin li ser kilamên dengbêjiyê. Rûdanên mezin bandora jiyana civakî ya li ser dengbêjiyê ye ku bi rêya saziya dengbêjiyê ve tên veguhestin. Îcrakirin, guhdarîkirin, qeydkirin û veguhestin jî bandora dengbêjiyê ya li ser civatê ye. Loma ev yek ji aliyê sosyolojiya edebiyatê ve hevbandoriya edebiyat û sosyolojiyê nîşanî me dide.

Kilama "Bavê Beced" (Şêx Fexrî) li ser kuştina wî ye. Di kilamê de vegotina Dilşê ya ji kurê xwe yê Beced re serboriya mêrê xwe vediguhêze hatiye teswîrkirin. Li gorî kilamê eşîrên Badika û Xiya bûne sedema girtin û kuştina Bavê Beced. Loma têgaha eşîrê li vir bi wateya neyînî hatiye bikaranîn:

"Dilşê digo lo lo Beced berxê sibe bû diçûme şewitiya Sînan û Bismilê

mi rebenê nizanibû çi bû, çi qewimî, ax lo çi ciriya

ew agirê kulê bikeve mala cendurmê Sînanê

mifreza Bismilê, eşîra Badika, giregirê jê di Xiya" (Güneş & Şahin, 2021a, r. 55).

Di rojevê de meriv rastî rûdanên nebaş û xerab bê carna wekî gazinc, tunebûna her tiştî tîne zimên û demên berê û yên niha berawird dike. Qîmet û nirxên ku winda bûne bi vî awayî li ser şahidiya merivan bandorên neyînî dihêle. Loma hin peyv hene ku hestiyariya merivan didin berçavan. Ev peyv, wekî olana heqiqetê hemû naveroka deq û vegotinê dorpêç dikin. Di kilamên dengbêjiyê de jî "eşîr nemane", "di eşîran de mêr nemane" wisa ne. Li ser vê tunebûnê dikare bê gotin ku wê çaxê jiyan jî, camertî jî, kevneşop jî tune ne. Ev yek bi prensîbên têkiliya sosyolojiya edebiyatê ve û ji aliyê rolên civakî ve dikare taybetiya eşîrê nîşan bide.

Di kilama "Ez Reben im" de hin mezinên eşîran dibin sedeme kuştina Bavê Salih. Di navbera vegotinan de hin guherîn hene. Têgeha eşîrê digel peyvên "eşîr nemane" û "di eşîra da mêr nemane" derbas dibe. Ev peyv, wekî wateyeke biberketinê camêrtiya eşîran nîşan didin:

"bi Tirkî nizanim bi Kurmancî leqeba wî ra dibêjin Seyîdxanê Kal e

bê agirê kulê bikeve mala Emerê Mihê, lawê Parîxanê

Eşîra Xiya, giregirê Badika

derbekî bi dest berdane bedena Bavê Salih peyaye Mala Ûsivê Seydo

sêr bike gelo vê sibengê eşîr nemane malxirabo di eşîra da mêr nemane" (Güneş & Şahin, 2021a, r. 106).

Di kilamên mînak de ji ber şer û lihevnekiriya eşîran, hêlek bûye sedema kuştinê û hêlek jî sûcdariya hêla din dike. Ev nakokî û rûdanên nebaş ên ji vê nakokiyê pêk tên digel nêrîna hêlekê ve tê vegotin û bi vî awayî kilam di navbera eşîran de pirsgirêkên dijwar nîşan dide. Ev, wekî dîtineke derveyî dikare bê navandin. Ji aliyê din ve jî dîtineke hundirîn diyar dibe. Digel gotinên "eşîr nemane" û "di eşîra da mêr nemane" wekî reşgirêdanekê heyfa eşîran vedibêje. Li vir em dikarin behsa hevbandoriya sosyolojî û edebiyatê bikin. Ji ber ku di kilamê de rewşeke civakî wekî şewqdanekê tê zimên, bi destê dengbêjî ve jî kilam dibe navbeynkariyeke reşgirêdanê.

1.6. Zîhniyeta Eşîran li Hemberî Kom û Mezhebên ji Xeynî Xwe

Motîvasyona civatê, di serî de li ser nasname, herêm, ol, çand û hêmanên wekî avaker tê. Loma komên wekî eşîran, li ser nirxên xwe, xwe û yekbûna xwe ava û geş dikin. Lê ev yek li hemberî eşîr û civatên din nakokiyan jî tevî xwe tîne. Loma jî hin caran yêdinkirin wekî hemû civatan di dîroka kurdan de jî tê dîtin. Li hemberî ecnebiyan û mezhebên din ev fikr û hestiyarî wekî berevaniya olê jî hatiye pêşkeşkirin. Di edebiyatê de yêdinkirin hem mijareke takekesî û psîkolojîk e hem jî bi encamên xwe ve sosyolojîk e. Ji hêla din ve dikare bi têkiliya çandî û netewî û hwd. jî bê watekirin. Kesên ku tên yêdinkirin an jî yêdindikin ji ber sedemên têkildar ên wisa ne ku yan serdest in an jî mexdûr in. Loma bi pêwendî hêmana eşîrê mijara yêdinkirin ji aliyê sosyolojiya edebiyatê ve têkiliya komên civakî û şewqdanên cur bi cur ên civakî nîşan didin.

Kilama "Asyayê", gazikirina Asyayê teswîr dike. Di kilamê de şerê eşîran ji aliyê mezheba sunîtîyê, di nav meşrûiyetekê de tê dîtin. Şerên din jî li hemberî mezheba sunîtiyê bi wateyeke neyînî tê pêşkeşkirin. Şerê wan neheq û li dijî dinê Îslamiyetê tê teswîrkirin. Ev yek li ser bikaranîna têgeha eşîrê zîhniyeta civatê eşkere dike:

"eva ne şerê Hesanan e

ne şerê Heyderan e

ne şerê Cibiran e

ne şerê donzdeh bavê eşîran e

hewşa kafirê Emir Tûman e

Ecem e beşîncî mezheb e, bê dîn û bê îman e

…

gavê din da li qarîşî şeriata Mihemed sekiniye

Asyayê digoti Besrayê da dayê dergûşa milê te lawîn e

tu bi destê Elfesya bigiri ji navê derkev here

go lê dayê rebenê ji te ra ne eyb e tu ji mi ra dibêjî gotinê were

bira dergûşa milê mi li dora lingê eşîra Mala Emer

herdu payayê Mala Mistefa Axa tev bigere" (Güneş & Şahin, 2021a, rr. 62-63).

Di vegotineke din de têgeha eşîrê weha derbas dibe ku şer û lêxistin di nav zîhniyeta eşîran de digel meşrûiyetekê hatiye dîtin:

"De lêxin, de lêxin bavê bavê mi lêxin

em ketine welatê ecemê qizilbaşê bêdînê bêîman

bira navê me bi xirabî bi ser eşîr û memleketê me da neçe" (Güneş & Şahin, 2019, r. 57).

Li gorî van mînakan meriv dikare bêje ku jiyan û zîhniyeta civakî bi awayekî rasterast şewq daye kilamên dengbêjiyê. Kom û mezhebên din bi destê jiyana rasteqîn bi awayekî cudaker û dijraber hatine dûrxistin. Îdeala edebiyat û lihevhatineke çêker negihiştine vegotinê. Ji aliyê sosyolojiya edebiyatê ve ev yek peyamên civakî û siyasî dihewînin.

1.7. Biryarên Siyasî yên Eşîran û Encamên Wan

Di naverokên kilamên eşîran de rolên kesayetên wekî mîr û şêx zêde ne. Honandin pirî caran li ser rûdanên mezin û kesayetên têkildar tê avakirin. Loma biryar û tevgerên wan digel encamên xwe di kilamên mînak de ji xwe re cih girtine. Li vir rolên civakî, temsîl û tîp û karakterên civakî yan jî taybetiyên kesayetên giring ji aliyê sosyolojiya edebiyatê ve eşkere ne. Dîsa meriv dikare qala peyamdayîneke civakî li ser veguhestina encamên biryara siyasî bike.

Di kilama "Bavê Şemsedîn" de eşîr, tevî Xalit Begê Cibîrî tê bikaranîn. Ji ber ku Bavê Şemsedîn ji aliyê hikumetê ve hatiye girtin û ev yek wekî heyfgirtina hikumetê tê nîşandan. Li vir eşîr û biryara wê ya hemberî hikumetê digel encaman tê pêşkeşkirin:

"Axao axao

…

bi destê Bavê Şemsedîn girtin ji qawûşa cendurme derkirin

fermana wî nivîsî avêtin stûya Xalito

tu nizanî hukumata niha tişta jî bîr nake

bira hewara Bavê Şemsedîn dibû pêsîrtengiya di mera

bira hewara Bavê Şemsedîn bihata mêrê mêrxas, înpoladê dewletê

gelo vê sibengê bavê eşîrê Xalit begê Cibirî" (Güneş & Şahin, 2021a, r. 68).

Hêsîrî û neçarî di jiyanê de ji bo civat û takekesan carna tiştekî wekî miqedder e. Dewlemendî û biderfetî di karaktera eşîrê de fonksiyoneke normal e. Lê wekî me

got li hemberî rûdan û rewşên nebaş ên wekî koç, sirgûn, şer û hwd. eşîr belawela dibin. Hêsîrî û neçarî jî bi awayekî siruştî vê heyfê tîne zimên. Ev yek ji aliyê sosyolojiya edebiyatê ve dikare di çarçoveyên mijar û naverokên civakî, peyam û şewqdana civakî de bê bicihkirin.

Kilama "Axao Ferman e" di vê xisûsê de wekî mînak e. Di vê kilamê de eşîr, bi hêsîrbûn û neçariya xwe tê vegotin. Di dawîya şerî de rewşa eşîran bi pêşerojeke dijwar tê teswîrkirin:

"ferman e axao ferman e ferman e
ferman e ferman e Mîrê Mîran e
tivêka teresê cendurman e
hewar û gaziya qereqol û qaymaqaman e
çi bikim destê Kurdane li ber rûyan e
eşîr ji xwe re hêsîr mane
berxê li peşiya bavê te ne havîn e, ne buhar e
li pêşya me her çar rojê sar e
ez nemînim vê sibengê qoce payîz û dîsa zivistan e" (Güneş & Şahin, 2021a, r. 81).

Ji aliyekî ve dikare bê gotin ku eşîr avakereke aqil û hişmendiya civaka kurdan e. Wekî kesayetên şêx, mele, rispî, serokên eşîran jî di biryar û tevgerên kurdan de rola berîdayînê pêk anîne. Di berpirsiyariya dîroka kurdan de serokên eşîran û kurên wan bi vî awayî kesayetên navdar in. Kilam jî bi piranî li ser navên wan tê zanîn an jî navandin. Rûdan û qewimînên ku li ser wan hatine, dikare bê gotin ku li ser civat û gel hatine. Kilamên dengbêjiyê jî bi vî awayî xwe ji van bêpar nehiştine. Ji aliyê sosyolojiya edebiyatê ve ev xisûs dikare di çarçoveya şewqdana civakî, tîp û karakterên civakî an jî taybetiyên kesayetên giring de bê nîşandan. Ji hêla din ve edebiyat bi taybetî bi pêwendî nasnameyeke kolektîf, hişmendiyeke civakî, yekbûniya komî, avakirina nexşeyên têgihiştinî yên netewî, olî û îdeolojîk ji xwe re cihekî ava dike (Alver, 2012, r. 17). Di warê sosyolojiya edebiyatê de dikare bê gotin ku ev yek daxwaz û kiryarên nivîskar û helbestvanî ji takekesiyê derdixîne û dike malê civakê. Çimkî vegotin li ser hebûna civatê ye.

Kilama "Silhedînê Mala Seydo -Wey Axao-", li ser vegera firarên binxetê radiweste. Ew vedigerin û di şerekî de tên kuştin. Ev rûdan, bi navbeynkariya dengbêjiyê wekî hestiyariyeke netewî xwe dide der û di bîra civakî de tê jiyîn. Di vê kilamê de heyfa mîran digel gotina "Bav û kalê te aqilbendê eşîrao" tê vegotin:

"Axao axao axao…
ji berê da camêrê mêrao
bav û kale te aqilbendê eşîrao
…
sibe ye yuzbaşî ji Bismilê derketî tê û dilezîne

…

dibe lawo ca werin ji min re bibêjin

fîrarê ji Binya Xetê hatine kî û kî ne

…

eger tu qala mahkûmê Binya Xetê ji min dikî

jê ra dibêjin Berxê Mala Seydo Silhedînê delûdîn e" (Güneş & Şahin, 2021b, r. 71).

Di dawiya van kilamên mînak de meriv dikare bibêje ku civat bêsiyaset nabin, siyaset jî digel rûdan û encamên xwe ve bêvegotin namînin. Ev yek di qada hunerê û edebiyatê de wekî bertekekê xwe nîşan dide lê ev bertek bi şêweya estetîk pêkan dibe. Ev dîmen têkiliya sosyolojiya edebiyatê nîşan dide.

1.8. Rolên Neyînî yên Eşîran di Navbera Xwe û Tevlîbûna Serdestan de

Di nav rewşên siyasî û demên zor de hin caran rolên eşîran diguherin. Ev guherîn, carna di navbera eşîran de carna jî li hemberî serhildanê digel tevîbûna hikumetê pêk tê. Ji xwe civat di dîrokê de li ber şert û mercên dijwar an jî li gorî berjewendiyên xwe biryarên cur bi cur didin. Li gorî Bruinessen (2022, r. 15), nakokî di organîzasyona eşîrê de fonksiyona zanqê dibîne û avahiya eşîrê ya dabeşbûyî vê çaxê dertê û ev yek jî wan hem bi hev tîne hem jî ji hev vediqetine. Çawa ku karaktera civatan hertim wisa bûye wekî vê yekê dikare bê gotin ku dîrok û kevneşopa devkî jî ev qeyd kiriye.

Kilama "Bavê Salih", têgeha eşîrê digel wateya xiyanetiyê dihewîne. Eşîr dibin sedema Bavê Salih û ev yek bi awayekî neyînî wekî "bêbav" û "bêbextî" tê dîtin:

"eşîreta bêbav Xiyaniyê ji êvar da bêbextî dor li kozika keke mi girtine

…

îro dengê tivingê eşîreta Xiyan ê bêbextî

ji êvar de li ser kozika keke mi da zar e zar e" (Güneş & Şahin, 2021b, r. 45).

Di kilama "Keremê Qolaxasî" de têgeha eşîrê bi awayekî berfireh û tevahî tê bikaranîn. Li hemberî serhildanê rola eşîran li vir ji ber sedema piştgiriya serdestan wekî neyînî hatiye bikaranîn:

"hukûmeta Turkiyayê tevî eşîra Kurdistanê

ez çi bikim felek xayîn e vê sibengê malxirabo

Keremê Qolaxasî, Evdalê bira

berê xwe dane Mala Silêmanê Ehmed ba Ferzende

got tu were vê sibengê îro şunda nava Turkiyayê îdara me nabe

emê ji xwe ra vê sibengê berê xwe bidin şewitiya vê Îranê" (Güneş & Şahin, 2021a, r. 102).

Di edebiyatê de nakokiya çêyî û xerabîyê tiştekî diyar e. Berhem li ser vê yekê tê avakirin. Kesayet, rûdan û avakerên hwd. ên berheman li dijberî hev wateyên xwe

dibînin. Carna jî xerabî û rewşên neyînî ji destên kesayetên nêzîk ve tên jiyîn. Ev yek di berheman de wekî rolên takekesî be jî di eslê xwe de ji me re senifandineke civakî nîşan dide.

1.9. Eşîr di Navbera Hezkiriyan de

Otorîteya eşîrê, hin caran li hemberî hezkiriyan wekî berbendekê ye. Yan di dema hevdîtinê yan jî rewşa revandinê de tê bîrê û bi awayekî dibe hişyarî di kilaman de. Ji aliyê din ve dijwarîyeke din jî he ye. Ev yek jî li hemberî eşîrê xwedîlêderketina hezkiriyê xwe ye. Li vir nakokiyeke di navbera civat û takekesiyê de dertê. Nakokî di avahiya berheman de hêmaneke jêneger e. Eşîr li ser vê yekê wekî hêlekê ye û şikil dide naveroka berheman.

Di kilama "Ez Xezal im Xirabmal im" de keç û xort bi hev re distrên. Eşîr di navbera keç û xortan de di nav xetereyê de tê vegotin. Bi devê keçikê hêza eşîrê wekî hişyardayînekê tê vegotin. Eşîr, li vir dîsa di rewşa hezkiriyan de otorîteya xwe nîşan dide û di navbera wan de dibe berbendek. Ji hêla din ve kurik jî ji pey hezkirîya xwe venagere û li hemberî vî şert û mercî li çareseriyekê digere:

"kuro delalîko eşîra mala bavê mi gelek in
min û te va tev dikujin
berxa dilê mi emê bibine kew û melhemê ax birînê lo birîndarê
emê rabin xwe bavên ber bextê esnaf û tucarê
…
emê bi destê hevdu bigirin derkevine zozanê jorîn
çend rojeka bigîjin qaçax û firara
kuro êtîmo eşîra mala bavê mi gelek in
min û te va tev dikujin" (Güneş & Şahin, 2021b, rr. 237-238).

Ev xisûs, di kilama "Hey La Hewilî Wey La Betilî" de jî tê bikaranîn. Keçik, rola dijwar a eşîrê ku li hemberî bihevrebûna wan e, tîne zimên:

"tu rabe vê sibengê emê bi destê hevdu bigirin
derkevin welatekî xerîb û xerîbistanê
bira kesekî me nas neke,
vê sibengê malxirabo eşîra mala bavê mi eşîreke giran e
wê te bikujin gelo vê sibengê sed yazixa xelka min î têlî telalî şebabî fodil
gelo vê sibengê malxirabo sed yazix û nefsa te ye" (Güneş & Şahin, 2021a, r. 272).

Eşîr, carna jî di kilaman de wekî jêvegerek e di rêya hezkiriyan de. Keç yan jî xort li hemberî wê rewşê bi awayekî wêrek biryareke dijwar digirin. Ev nakokiyeke zelal e di navbera otorîteya eşîrê û takekesan de. Têkoşîna kesayetan û lehengan jî di vegotinan de li hemberî zordest û serdestan dibe tevgereke giranbiha.

Di kilama "Min Birevîne" de ev wêrektiya ji bo xwedîlêderketina hezkiriyê xwe tê zimên lê dijwarî jî pêwendî ye:

"berxa dilê mi gelo tu dêhna xwe bide
Êl û eşîra mala bavê xwe temamî tev xirab kim
Di bextê te û Xwedê ketime van gotina teyê jehr ji mi ra gotiye
Ezê dikim nakim dilê mi tehemul nake
Axîna dilê min giran e dilê mi gelo lo bawer nake" (Güneş & Şahin, 2021a, r. 331).

Mînakên kilam ên ku hatine pêşkeşkirin, rola eşîrê di rêya hezkirinê de yan tiştekî jêveger yan jî nejêveger diyar dike. Ev jî bi taybetiya xwe dikare wekî nakokiya takekes û civatê bê diyarkirin. Li vir eşîr bibe sedem an jî bê fedakirin jî giraniya wê di vegotinê de tê dîtin. Loma dikare bê gotin ku herçiqas hezkirin di van mînakan de bê girisandin jî siya eşîrê bi awayekî xwe nîşan dide. Li gorî vê, meriv dikare bandora sosyolojiyê ya li ser edebiyat û vegotinê bîne zimên.

Encam

Di vê xebatê de, hin kilamên dengbêjiyê li gorî bikaranîna têgeha eşîrê hatine nirxandin. Ji bo vê nirxandinê jî me hin mijar û nêzîkatiyên sosyolojiya edebiyatê bi kar anîn. Di encama lêkolînê de hatiye dîtin ku têgaha eşîrê ji aliyê sosyolojiya edebiyatê ve bi wateyên cur bi cur di kilamên dengbêjiyê de cih wergiritine. Ji ber ku eşîr di avahiya civaka kurdan de nirxekî berpêş e û ji aliyê civakî, takekesî û siyasî ve xwe nîşan dide, li derdora hin rûdanan bi rolên erênî yan jî neyînî radibe. Ev yek jî wekî rastiya jiyanê ye ku olan daye li ser kilaman. Dengbêj, rûdan û rewşên rasteqîniyê bi awayekî devkî û sêwirandî xistine qada huner û çanda kurdan. Piştre jî ev yek şikil daye bîra civakê. Têgeha eşîrê jî bi navbeynkariya kilamên dengbêjan bi vî awayî di qada hunerê de gihiştiye heta niha. Loma di hişmendî û hestiyariya kurdan de rola eşîrê hê jî berbiçav e.

Bi vê xebatê bikaranîna kilamên dengbêjiyê digel hin sernavan hatiye diyarkirin. Naverokên sernavan jî li gorî qada sosyolojiya edebiyatê digel hin hêmanên têkildarî civakê hatine şirovekirin. Li ser vê yekê di xebatê de "hevbandora edebiyat û civatê, mijar û naverokên civakî, rolên civakî, peyam, temsîl û wate, şewqdana civakî, tîp û karakterên civakî an jî taybetiyên kesayatên giring, têkiliya komên civakî" û hwd. bûne wekî hêmanên diyarker.

Hatiye tesbîtkirin ku di kilamên mînak de dab û nerît û qeydeya eşîrê li hemberî xerabiyê wateyek e. Ji bo civatê wekî merciyeke pejirandinê ye. Peyva "nava eşîra" pirî caran derbas dibe û wekî sedema biryar û tevgeran e û ev pejirandina berbehs bi vî awayî didome. Takekes û civat an biryar û tevgerên xwe li gorî "nav eşîran" dikin an jî li gorî wan li benda hin rewşan in. Dîsa bikaranîna hejmara eşîran wekî mînak "bîst û çar" û "donzdeh" bêtir derbas dibe ku tê wateyên cur bi cur. Yan wate bi vî şiklî xurt dibe û giraniya eşîran xwe nîşan dide yan jî di hin cihan de ev zêdebûn ji bo xeml û pesnê jinê tê bikaranîn. Eşîr wekî "deriyê av û rizqê" jî tê dîtin ku li hemberî dem û rewşên dijwar ev rol derdikeve holê. Eşîr di hin kilaman de wekî sedema girtin û kuştina mêran e jî di navbera eşîran de yan jî digel piştgiriya serdestan ev wate pê-

kan dibe. Zîhniyeta eşîran li hemberî kom û mezhebê ji xeynî xwe jî diyar dibe di hin kilaman de. Hin eşîr û mîr hene ku serî hildane û bi vî awayî li gorî biryar û tevgerên xwe digel wateyên siyasî hatine bikaranîn û rastî encamên dijwar jî bûne. Eşîr, di hin cihan de li ber şert û mercên dijwar ên dîrokî wekî hêsîr û neçar derbas dibin. Di hin cihan de eşîr û hêza wê ya leşkerî û siwarî di nav nakokiyan yan jî honandineke lehengî de tê pêşberî xwîner û guhdaran. Li hemberî rewşên dijwar tunebûna eşîran tê vegotin ku peyvên "eşîr nemane", "di eşîra da mêr nemane" wateya liberketinê nîşan dide. Rolên neyînî yên eşîran di navbera xwe û tevîbûna serdestan de digel nakokiyan tê vegotin. Gazîkirina eşîran jî wateyan dihewîne ku bêtir hatiye bikaranîn. Ji ber ku xweziya alikarîyê yan jî şahidiya wan hatiye amanckirin. Heyfa mîran tê kirin ku bi pêwendî windabûna hişmendiya eşîrê ye. Qîmetzanîna eşîran jî tê kirin ku di tunebûna wê de rewşên xerab tên nîşankirin. Eşîr, wekî berbendekê di navbera hezkiriyan de ye jî. Giraniya wê dibe sedem û nikarin bi hev re bin. Carna jî eşîr, seba hezkirîyê dibe jêvegerekê. Rexneya eşîrê jî tê kirin ji sedema bêkêrîyê ve. Eşîr pir in lê li hemberî derfet û berjewendiya gel bêfonksiyon in.

Ev tesbît hemû nişan didin ku eşîr di nav kilamên dengbêjiyê de wekî têgeheke xurt hatiye bikaranîn û ji ber ku eşîr di nav jiyana kurdan de xwedî roleke mezin e wateyên wê cur bi cur in. Bi vî awayî bi pêwendî hevbandoriya jiyan û hunerê, rolên wê yên civakî li ser kilamên dengbêjiyê jî tên dîtin. Ev hemû ji me re ji aliyê sosyolojiya edebiyatê ve balkişandina têgeha eşîrê dikin.

Extended Abstract

This study examines the use of the concept of "tribe" in selected kilam (songs/narratives) performed by dengbêjs. To this end, various approaches and thematic concerns within the sociology of literature are taken into consideration. The study concludes that the concept of the tribe carries multiple meanings in dengbêj narratives from the perspective of literary sociology. This is because the tribe occupies a central place in Kurdish social structure and is understood to play both positive and negative roles in relation to events across social, individual, and political dimensions. As a lived social reality, this is reflected in the narratives. Dengbêjs incorporate real events and situations into Kurdish artistic and cultural life by weaving them into oral narratives, which in turn contribute to the formation of collective memory. The concept of the tribe has thus maintained its presence in the artistic sphere through dengbêj narratives up to the present day. For this reason, the role of the tribe in the Kurdish mental and emotional world remains distinctive.

In this study, the use of the concept of the tribe in dengbêj kilams is examined under several thematic headings. Within these, elements of social relevance are interpreted through the lens of literary sociology. In this context, the study identifies key analytical dimensions such as the interaction between literature and society, social themes and content, social roles, messages, representation and meaning, social reflections, social types and characters (or the characteristics of significant individuals), and the relationships among social groups.

Analysis of the selected narratives shows that customs and tribal traditions retain meaning despite their negative aspects and function as an authority of social acceptance. The expression "within the tribe" frequently appears, shaping decisions and behaviors and reinforcing this authority. Individuals and communities act or position themselves accordingly. References to the size or influence of tribes -such as "twenty-four" or "twelve"- also recur with varying connotations. These references either reinforce meaning and demonstrate tribal power or, in some cases, intensify the praise and glorification of a woman or lover. The tribe is often portrayed as a source of sustenance and livelihood in times of hardship. In some narratives, tribal affiliation serves as a justification for violence, such as killing or taking captives in conflicts with other tribes, or as a mechanism for supporting those in power. In other instances, the tribal mindset encompasses opposition to external groups and sectarian structures. Certain tribes and their leaders are depicted as confronting the political consequences of their decisions, particularly in relation to rebellion. In some regions, tribes are represented as captive and powerless under difficult historical conditions. Narratives also depict the tribe through images of military strength and heroism, particularly in contexts of conflict. Conversely, expressions such as "there are no tribes left" or "there are no men left in the tribes" convey a sense of loss and lament in the face of hardship. Internal conflicts, as well as the limited partici-

pation of tribes in governance, highlight their negative roles within their own communities. Appeals to tribes are frequently made for assistance or testimony, indicating their continued social significance. Mourning for tribal leaders is also present, symbolizing the weakening or absence of tribal authority and mentality. While the importance of tribes is emphasized, their absence is often associated with negative consequences. In some narratives, the tribe appears as an obstacle to the union of lovers; in others, it is depicted as something that may be sacrificed for love. A critical perspective also emerges regarding the tribe's inefficiency, as large tribal structures are sometimes portrayed as failing to serve the broader interests and needs of the people.

These findings demonstrate that the concept of the tribe functions as a powerful and multifaceted element in dengbêj narratives. This is closely related to the central role of the tribe in Kurdish social life. Accordingly, the social roles of the tribe are reflected in dengbêj kilams through the dynamic interplay between life and art. This situation underscores the significance of the concept of the tribe within the framework of literary sociology.

Çavkanî / Refences

Alay, O. (2019). Sözlü Gelenek Odağında Söz Ustası Dengbêjler ve Yakın-Uzak Akrabaları. *Uluslararası Dengbêjlik Kültürü ve Dengbêjler Sempozyumu*, rr. 53-71, Şirnex: Weşanên Şırnak Üniversitesi.

Alver, K. (2012). Edebiyatin Sosyolojik İmkânı. *Edebiyat Sosyolojisi* (Çapa 3.), (Ed. Köksal Alver), rr. 11-19. Enqere: Weşanên Hece.

Aslan, M. (2019). Taybetmendiyên Hunera Dengbêjiya Kurdî. *Uluslararası Dengbêjlik Kültürü ve Dengbêjler Sempozyumu*, rr. 329-349, Şirnex: Weşanên Şırnak Üniversitesi.

Boyce, M. (2025). "Gosan"ê Partî û Kevneşopiya Dengbêjiyê ya Îranî. (wer: Aydın Ekin). *Nubihar Akademi,* 23, 159-189. https://izlik.org/JA24LX94NT

Bulmuş, S. (2018). Müzik ve Politika İlişkisi Bağlamında Dengbêj Müziğinin Toplumsal İşlevi. *Uluslararası Etnomüzikoloji Sempozyumu-Müzik ve Politika Sempozyum Bildiri Kitabı,* rr. 160-173. Bursa: Komelaya Etnomüzikoloji.

Bozkurt, İ. (2021). *Aşiretler Tarihi* (Çapa 2.). Stenbol: Weşanên Nûbihar.

Bruinessen, M. V. (2022). Kürt Aşiretlerinin Muhtelif Tezahürleri. *Aktör, Müttefik, Şaki/Kürt Aşiretleri*, (Berhevkar: Tuncay Şur & Yalçın Çakmak), rr. 13-20. Stenbol: Weşanên İletişim.

Coşkun, S. (2012). Edebiyat Sosyolojisi Araştırmaları İçin Bir Yöntem Denemesi. *Edebiyat Sosyolojisi* (Çapa 3.), (Ed. Köksal Alver), rr. 265-274. Enqere: Weşanên Hece.

Çifçi, T. (2015). Di Çarçoveya Çanda Devkî De Di Nav Civaka Kurdan De Dengbêj û Saziya Dengbêjiyê. *International Journal of Kurdish Studies*, 1 (1), 110-124. https://doi.org/10.21600/ijoks.106008

Delikaya Ö, & Ertekin, M. Z. (2021). "Li Geliyê Çatê Tav Diziriqî: Topogeny û Nexşeya Devkî di Kilama Elî Xarza de", *Kurdiyat*, 3, 11-25. https://izlik.org/JA55CM89TB

Delikaya, Ö. (2024). Navê Cihan, Mekanên Bîrê û Geliyê Zîlan di Çanda Dengbêjiyê de. *Mukaddime*, 15(1), 15-40. https://doi.org/10.19059/mukaddime.1453602

Delikaya, Ö. (2025). Şair, Dengbêj, Sazbend û Aşiq: Nêrînek li Termînolojiya Îcrakarên Edebiyata Kurdî ya Devkî. *Mukaddime*, 16(1), 231-261. https://doi.org/10.19059/mukaddime.1515868

Eroğlu, Y. (2025). Toplumsal Güven İnşasında Aşiretlerin Rolü: Hakkari Örneği Üzerine Nitel Bir Araştırma. *Şarkiyat*, 17(1), 222-243. https://doi.org/10.26791/sarkiat.1593304.

Escarpit, R. (1992). *Edebiyat Sosyolojisi* (Wer. Hüseyin Portakal). Stenbol: Weşanên İletişim.

Escarpit, R. (2012). Edebiyat Sosyolojisi (Wer. Salih Özer). *Edebiyat Sosyolojisi* (Çapa 3.), (Ed. Köksal Alver), rr. 65-82. Enqere: Weşanên Hece.

Filiz, İ. (2021). Aşiretlerde Kadının Kimliği/Kimliksizliği. *Aşiret-Türkiye'de Aşiret ve Aşiretin Dönüşümü*, (Ed. Mehmet Tayanç & Ahmet Aktaş), rr. 49-80, Konya: Pirtûkxaneya Çizgi.

Güneş, Ö. & Şahin, İ. (2019). *Dengbêj Reso-Antolojiya Dengbêjan* 1. Stenbol: Weşanên Nûbihar.

Güneş, Ö. & Şahin, İ. (2021a). *Dengbêj Şakîro-Antolojiya Dengbêjan 2* (Çapa 3). Stenbol: Weşanên Nûbihar.

Güneş, Ö. & Şahin, İ. (2021b). *Dengbêj Huseyno-Antolojiya Dengbêjan 3*. Stenbol: Weşanên Nûbihar.

Güneş, Ö. & Şahin, İ. (2023). *Dengbêj Mehmudê Hesê-Antolojiya Dengbêjan 4*. Stenbol: Weşanên Nûbihar.

Gürür, Z. (2014). Dengbêjî di Peywenda Patronajê de. Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî, , Mêrdîn.

Karacan, H. & Nayman, R. (2014). Dengbêj Salihê Qubînî İle Karapetê Xaço'nun Şarkılarında Aşiret Kavgaları: Filîtê Quto ile Elî Etmanki Kavgası. *Dicle Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, 16,2, 361-388.

Korkmaz, E. (2023). Kürt Mirleri Üzerinden Söylenen Beyitlerin Hermenötik Analizi. *Bitlis Eren Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 12(1), 20-38. https://doi.org/10.47130/bitlissos.1298062

Kösemihal, N. Ş. (1964). Edebiyat Sosyolojisine Giriş. *İstanbul University Journal of Sociology*, 2 (19-20), 1-37. https://izlik.org/JA29XE26HL

Mela Mehmûdê Bazîdî (2021). *Adat û Rusûmatname'ê Tewayifê Ekradiye* (Amedekirin û Tîpguhêzî: Murad Celalî). Stenbol: Weşanên Nûbihar.

Moran, B. (2012). *Edebiyat Kuramları ve Eleştiri* (Çapa 22.). İstanbul: Weşanên İletişim.

Ölçer, H. (2023). Giséle Sapiro. Edebiyat Sosyolojisi. *Nosyon: Uluslararası Toplum ve Kültür* Çalışmaları Dergisi, 11, 75-81. https://izlik.org/JA85XD62CZ

Soykan, Ö. N. (2009). Edebiyat Sosyolojisi-Kuram ve Uygulama- (Berhevkar: Ömer Naci Soykan). Stenbol: Weşanên Dönence.

Subaşı, K., Yıldız, A., & Kaplan, L. (2025). Di Çarçoveya Danasîna Arşîva Evdilahê Necar da Dengbêjên Kurd ên Hewzaya Berferatê û Vegêranên ku Îcra Kirine. *Dilbilim ve Karşılaştırmalı Edebiyat -Karşılaştırmalı Edebiyat-,* (Ed. Ahmet Kırkan-Yunus Cengiz) rr. 889-934, Mêrdîn, Weşanên Mardin Artuklu Üniversitesi.

Süphandağı, İ. (2018). Edebiyat Sosyolojisi ve Oryantalizm Bağlamında 'Masal' Şiirinin Tahlili. *International Journal of Languages' Education and Teaching*, 6(4), 280-299. https://izlik.org/JA34JL28NF

Şan, M. K. (2012). Edebiyat Sosyolojisinin Tarihinden Basamaklar. *Edebiyat Sosyolojisi* (Çapa 3.), (Ed. Köksal Alver), rr. 127-168. Enqere: Weşanên Hece.

Şen Altın, N. (2017). Edebiyat Sosyolojisinin Sınırları. *International Journal of Social Inquiry*, 10(2), 37-57.

Şur, T. & Çakmak, Y. (2022). Başlarken… *Aktör, Müttefik, Şakî/Kürt Aşiretleri* (Berhevkar: Tuncay Şur & Yalçın Çakmak), rr. 9-11. Stenbol: Weşanên İletişim.

Uluç, A. V. (2010). Kürtler'de Sosyal ve Siyasal Örgütlenme: Aşiret. *Mukaddime*, 2(2), , 35-52. https://doi.org/10.19059/mukaddime.59464

Yorğun, T. (2024). Karwan, Eşîr û Bazinbelek: Nêrînek li Varyantên Filîtê Quto. *Kurdiyat* (9), 39-76. DOI: 10.55118/kurdiyat.1488769

Article Info

Article Type	Research Article
Peer-Review	Double anonymized - Two External
Ethical Statement	It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited.
Plagiarism Checks	Yes – İntihal.net
Conflicts of Interest	There is no conflict of interest between the author and any parties in the article.
Complaints	The author(s) has no conflict of interest to declare. For any complaints: nubiharakademi@gmail.com
Grant Support	The author(s) acknowledge that they received no external funding in support of this research.
Copyright & License	Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the **CC BY-NC 4.0**.
Indexing	EBSCO, DOAJ, ERIH PLUS, Ulrich's Periodicals Directory, Linguistic Bibliography, MLA
Al Policy	The author(s) declares that they have not used AI in producing this paper.